Eskilstuna Energi & Miljö

Eskilstuna Energi och Miljö Försäljning AB
Kungsgatan 86, 631 86 Eskilstuna
eem.se/kundservice | 016-10 60 60 | kundservice@eem.se

# Kurtasiya şert û merc û rêzikên Eskilstuna Energi och Miljö'yê ji bo bazirganiya karebayê.

## Ev girêbest ji kengî ve dikeve ber pêwîstiya bicihanînê?

Girêbesta karebaya te demekê dikeve ber pêwîstiya bicihanînê ku te piştrastkirina girêbestê wergirtibe.

## Mafê paşvekişiyanê – tenê ji bo bikarhêneran tê sepandin.

Piştî wergirtina piştrastkirina girêbestê, tu xwedan maf î ku bo heyama 14 rojan bêyî destnîşankirina tu hegerekê dev jê berdî û paş vekişî.

## Ev heyam demek e ku girêbesteke karebayê bêyî heyama pêwîstîhêner derbasdar e.

Girêbesteke karebayê bêyî heyama pêwîstîhêner heta wê demê ku tu girêbesta karebayê betal bikî yan bo girêbesteke karebayê ya din veguherînî, derbasdar e.

## Ev heyam demek e ku girêbesteke karebayê bi heyama pêwîstîhêner derbasdar e.

Girêbesteke karebayê bi heyama pêwîstîhêner heta rojdema dawiyê ya destnîşankirî di girêbesta te de derbasdar e.

## Heyama ragihandinê

Heke girêbesteke te ya karebayê bêyî heyama pêwîstîhêner heye ku heta danezana din derbasdar e, 14 rojan piştî fesixkirina girêbesta karebayê ji aliyê te ve dem dibe heta ku derbasdariya wê ji nav biçe.

Heke herî kêm 14 rojan beriya bidawîhatina girêbesta karebayê, girêbesta karebayê ya xwe nûve nekî an jî betal nekî, tu yê bi awayê xwebixwe girêbesteke bêsînor wergirî.

## Heke girêbesta karebayê ya te bi heyama demî ya neguher dema wê bi dawî were, dê çi biqewime?

Heke tu girêbesta karebayê ya xxwe herî pirr heta 14 rojan beriya bidawîhatina girêbesta karebayê nûve nekî yan betal nekî, tu yê bi awayê xwebixwe girêbesteke bêsînor wergirî. Girêbestên bêsînor pirranî hinekî bihatir in. Zanyariyên têkildarî bihayên me dikarî li ser malpera me ya bi adresa ***eem.se/teckna-elavtal*** bibînî.

Girêbesta bêsînor heta wê demê ku girêbesteke karebayê ya din bi me re wajo bikî yan girêbesta karebayê ya xwe betal bikî, derbasdar e. Tu dikarî di her demekê de kubixwazî girêbesta bêsînor biguherînî yan betal bikî.

Eskilstuna Energi och Miljö Försäljning AB
Kungsgatan 86, 631 86 Eskilstuna
eem.se/kundservice | 016-10 60 60 | kundservice@eem.se

## Heke tu girêbesta karebayê ya xwe zûtir ji dema diyarkirî fesix bikî, dê çi biqewime?

Heke girêbesteke ta ya karebayê heye ku pêkhatî ji bihayê karebayê ya neguher e û biryar bidî ku wê beriya rojdema dawiyê betal bikî, ev maf ji bo me parastî ye ku em pereyekî wek xerebû ji ber betalkirina girêbesta karebayê ji te bistînin.

## Ev yek di rewşekê de tê sepandin ku em her tiştekî di şert û mercên girêbesta xwe de biguherînin.

Heke girêbesta karebayê ya te blêyî heyama demê bikeve ber pêwîstiya bicihanînê, em ê herî pirr du mehan ji pêş ve te ji pêwîstîbûna cihanîna guherînan te haydar bikin.

Heke girêbesta karebayê ya demeke xwe ya diyarkirî heye, şert û mercên girêbestê tenê piştî mawebiserçûna girêbestê diguherin.

Ev maf ji te re heye ku girêbesta karebayê ya xwe di rewşa sepandina guherînan di şert û mercên girêbestê de fesix bikî. Di vê rewşê de, tu divê herî pirr 14 rojan beriya sepandina guherînan, girêbesta karebayê ya xwe fesix bikî.

## Heke cihê xwe biguhezînî

Heke cihê xwe diguhezînî, beriya cihguhestinê divê bi me re têkilî dayînî. Girêbesta karebayê ta bo adresa te ya nû tê şandin, meger ku em berovajî wê yekê ji te re bibêjin. Me ev maf heye ku dema cihguhestiona te girêbesta karebayê ya te fesix bikin.

## Peredan û derxistina fatûreyê

Em mehê carekê ji bo te fatûreyê derdixin. Em hertim dema ku qasa karebaya bikarhatî ya te seh dikin, fatûreyên paşdamayî ji bo te dişînin.

Kesên rasteqîne 20 roj û kompaniyan 30 roj dem û derfet hene ku pereyê fatûreyan bidin.